Newroz

Dr Nûredîn Zaza
1919- 1988

Osman Sebrî
1905 - 1993

Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de

Hejmar (88-89) *B. Çile* *2009 z - 2621 k* *Buha (15))*

Kurd di bîranîna mafên mirovan de

Hersal bi hatina roja 10-ê meha Berçile re , hemî partî , komele , rewşenbîr , hunermend , dezgeh û dewletên şaristanî , naverokên belgenameya mafên mirovan tînin zimên , xal û bendên wê belgeya navnetewî ya ku civata rêxistina netewên yekbûyî li sala 1948 an pejirandibû û li ser erê kiribû , dijmêrin . Di weşan û medya xwe de didine xuyanîkirin .

Hêjayî gotinê ye ku wê hîngê , di wê civata navnetewî û dîrokî de nûnerê dewleta Sûriyê birêz Faris Elxorî bû . Siyasetvan , rewşenbîr û mirovhezekî gewre û navdar bû . Loma jî , di nivîsandin û amedekirina reşika belgenameya mafên mirovan de xwedî roleke balkêş bû . Nemaze , ji bilî zimanê xwe yê Erebî , bi Firansî , Ingilîzî û Tirkî jî baş dizanî . Bêdudilî , bi xurtî û dilsozî li mafên mirovan dibû xwedî , û di ber nêrînên xwe de bi zarzimanekî zelal û lihevhatî şer dikir . Vêca bi xêra helwesteke weha û nûnerekî weke rehmetî Faris Elxorî , rûyê gel û dewleta Sûriyê, di civatên navnetewî de sipî û ciyê rêzgirtinê dibû .

Îro jî , piştî derbasbûna 60 salî di ser wê bûyera navnetewî re , her diçe pêwistî û giringiya wê belgenameya mafên mirovan bêtir dibe , û bona hebûn û jiyana mirov û gelan li seranserî herêm û deverên cîhanê pêdiviyeka li cî , zor pêwîst û bêhempa ye .

Li dawiya salên 1960 - iyan , li Şamê , sê berpirsiyarên serkirdayetiya dewleta Sûriyê berê xwe dabûne mala Osman Sebrî û jê dipirsîn : ((ustaz (mamoste) Osman , hûn kurdên **D.R (15)**

Email : Newroz 95 @ hotmail . com

Îran Celadê..
Hemîd Muxtarî 3

Çavê gelê …
Rêberê Silîvî 5

Kurd Li Sûriyê…
Cotyar Murad ٦

Di roja cîhanî.....
Lava Derwêş 8